Newroz Hejmar (78) Rûpel (4) Subat 2008z – 2619k

Eve, sergotara hejmara pêşî ji rojnameya KURDISTAN e, bi pênûsa Mîr Miqdad Midhet Bedirxan , di 22ê nîsana sala 1898an de hatiye nivîsandin.

Guhestina tîpan: Rêberê Silîvî

Bisimillah al rehman al rehîm

Sed hizar şikir û hemd ji Xwedê te,ala re em misilman xelq kirin û zanîna ilm û me,rifetê re hiş û zeka da me. Derheqa elimandina ilm û me,rifetê re gelik(gelek) ayetên celîle û ehadîsê şerîfe henin, dinyayê de çiqas misilman hebin, gund û bajarên hemiya de mekteb û medrese û cerîde henin, dinyayê de çi dibe çi nabe cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelik(gelek) qewma zêdetir xwedî hiş û zeka ne, camêr in, di binên xwe rast de û qewî ne, xurt in, û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in, dinyayê de çi dibe, cîranê wan misqof çaweye, wê çi bike, nizanin. Lewma riya Xwedê de, min ev cerîdeya ha nivîsî, bi izna Xwedê te,ala paş niho her pazde roja de carekê ezê cerîdekê binivîsim. Navê vê min kiriye (**Kurdistan**), vê cerîdeyê de ezê behsa qenciya ilm û me,rifeta bikim, li kû derê mirov die,lime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ezê nîşan Kurda bikim, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ezê hemiya hikat bikim.

Heta niho kesî cerîdekî hole ne nivîsiye, ev cerîdeya min a ha, ya ewilî ye, lewma wê gelik kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin, hemî tişt wekî nû çêdibin kêm in, paşê hinkî diçe dikewe rê de, eve îdî ezê dest meqsedê bikim (we min ellahi al tewfîq

Pişti 83 salan jî hê aşiqê hevdu ne

MÛŞ, 15/2 2008 — Duhî roja evîndaran bû. Li bajarê Mûşê yê bakurê Kurdistanê Sedîqe Çelikela 116-salî eve 83 sal e ko digel evîndarê xwe Mirad Çelikelê 107-salî dijî û duhî dema ko Mirad Çelikelî guleka evîndariyê da Sedîqeyê herdu çavên wê tejî bûn û got: Bila eşqa me bibe nimûne ji bo ciwanan. Sedîqe Çelikel û mêrê wê Mirad Çelikel li gundê Kapiliyê yê qezaya Korkutê ya Mûşê dijîn û heşt zarokên wan û li ser hev 150 nevî û nevîçîçirkên wan hene.

Ji bo îsbatkirina evîndariya xwe duhî bapîrê 107-salî Mirad Çelikelî guleka sor da dapîra 116-salî Sedîqeyê û got ew niho jî wekî roja pêşiyê ji xanima xwe hez dike. **Ji malpera Nefel hatiye girtin**

Cejna Evînê, Li Hemî Evîdaran Pîroz Be